# VEGER

Raporek derbarê vegera derbiderên Efrînê ji bo cih û warên xwe

ŞAK

Şepêla Azadî



# VEGER

Raporek derbarê vegera derbiderên Efrînê ji bo cih û warên xwe

ŞAK

Şepêla Azadî

Çileyê pêşî/ 2024

**Pêşgotin**

Di destpêkê de divê hinekî operasyonên leşkerî yê gropên çekdar destpê kirine, çirove bikin ku berî derbiderbûn û vegerê destpê kiribû

**Operasyona Lêvegerandina Êrîşê**

Berbanga Roj Çarşemê di 27.12.2024an de Desteya Rizgarkirina Şamê HTS ( El-Nusre ya berê) ligel hin gropên çekdar ên din weke operasyona El-Fetih El-Mubîn, destpêkirina Operasyona Lêvegerandina Êrîşê ragihand. Her tişt bi lez û bez bû li ser erdê û gelekî jî pêşve çûn. Di encamê de HTS dest danî ser Helebê. Bêyî ku rejîm berevaniyê bike, vekişiya. Lê HTS li Helebê bi tenê nesekiniya û berê xwe da Hemayê û li wir jî şer kirin. Ew jî nîşana wê yekê ye, ku HTS dixwaza devera di bin kontrola xwe de fırehtir bike.
Bi fırehbûna desthilata HTS û nêzîkbûna ji herdu taxên Şêx Meqsûd û Eşrefiyê yên piranî kurdnişîn li Helebê, metirsiyên li ser çarenivîsa van herdu taxan bêtir bûn, herwiha Bajarê Til Rifat û derdorê, ku di bin kontrola YPG, rejîm û îraniyan de bûn. Metirsî çêbû şerek derkeve û kurdên sîvîl bibin qurbanî an jî li dijî Kurdan kiryarên tolhildanê bêne kirin. Hêzên Sûriyaya Demokrat(HSD/QSD) hewlda deverên xwe bi rêya vekirina korîdorekê di navbera Munbicê û Şêx Meqsûd, Eşrefiyê û Til Rifatê de girê bide, da ku xelkê xwe ji wan deran derxîne, lê bi serneket. Ji ber vê jî di destpêkê de YPG dest ji herdu bajarokên Nubol û Zehra berdan û jê vekişiya, piştî vekişîna rejîmê ji herdu bajarokan, ku herdu jî şî'enişîn in û li ser sînorê başûrê rojhilatê Efrînê dikevin

**Operasyona Berbanga Azadiyê**

Piştî operasyona HTS, çekdarên gropên Artêşa Niştimanî yên ser bi Tirkiyê ve ( Tirkiyê di 2017an de ava kir) di 30.11.2024an de Operasyona Berbanga Azadiyê ragihand ku armanca wan kontrolkirina deverên di bin destên YPG de li Til Rifat û derdorê û gundine Efrînê ku hîn YPG ew kontrol dikirin û li ser sînorên herdu bajarokên şî'enişîn Nibol û Zehra li bakurê rojhilatê Efrînê bûn.
Di du rojan de û piştî ku YPG ji wan deveran vekişiya û berê xwe da Helebê (Şêx Meqsûd û Eşrefiyê) çekdaran ew dever bi temamî kontrol kirin, lê mixabin YPG piraniya xelkê neçar kir pêre derkeve û piştre wan bibe Tebqa û di konan de bi cih bike, ku jiyan li wê derê nabe.
Gelek ji derbiderên vegeriyane Efrînê piştrast kirin, ku çekdarên YPG gefên kuştinê li wan xwarin eger dernekevin Heleb û Tebqayê, ku tirsê bêtir têxe dilê xelkê û kes venegere Efrînê. Herwiha şahidhalan tekez kirin, ku YPG bi guleyan davêtin tekerên tirektor û otombêlên derbiderên dixwestin vegerin Efrînê. Herwiha şahidhalan piştrast kirin, ku YPG hêlên internetê jî ji ser xelkê

birîn ku kes ji hindurî Efrînê pêwendiyê bi wan re neke û venegerîne. Hineke din jî hebûn dixwestin berên xwe bidin Tebqayê, lê nikarîbûn û li Til Rifatê asê man. Heman senaryo di dema vekişîna YPG ji Efrînê di 2018an de li ser rêya Cebel El-Ehlam çêbû.
Çekdarên gropa Hêza Hevbeş ya Emşat û Hemzata li gundên ji dest YPG standine , weke gundê Burc Qasê li Şêrawa, dest bi dizî û talankirinê kirin, hem otombîl û hem jî tiştên malê diziyan.

**Bangên Vegerê û guhnedana pîlanên PYD û çekdarên wê**
Şepêla Azadî ya Kurdistanî ligel partiyên hevpar weke Partiya Demokrat a Kurd li Sûriyê (El-Partî), Tevgera Aştiya Niştimanî ya Kurd li Sûriyê û Tevgera Kurdayetiyê li Sûriyê, ji partiyên sereke bûn ku di 01.12.2024an de bang li derbiderên Efrînê li deverên Til Rifatê û derdorê kirin vegerin cih û warên xwe. Daxuyaniya hevbeş ya partiyên navbûrî bang li xelkê kir guh nedin pîlanên YPG, ku wan careke din derbider nekin û ji axa wan dûr nexin û nexine ti şerên ne di berjewendiyên kurdan de. Herwiha daxuyaniyê bang li YPG jî kir, ku xelkê me nexîne ti şeran û sîvîlan biparêze, bang li ENKS kir, ku hevparê Îtîlafê ye, rê li ber çekdaran bigirin û berên xwe nedin deverên kurdî û careke din xelk koçber û derbider nebe û guhertineke demokgrafî ya nû çênebe.

**Karwanên Vegerê**
- Yekemîn karwana vegerê di 02.12.2024an de destpê kir, ku bêtirî 350 malbatî di rêya Gundê Qitmê yê Navçeya Şikak/Şera re vegeriyan cih û warên xwe. Xelkê me jî bi pêşwaziyeke germ derketin ser rêyên wan û deriyên malên xwe jê re vekirin.
- Roja diwem di 03.12.2024an de bêtirî 400 malbat di rêya Gundê Qitmê re vegeriyan.
- Roja sêyem di 04.12..2024an de û ji ber hatina zêde a derbideran, rêya Cebel El-Ehlam ji aliyê Şêrawa ve hate vekirin û tê re bêtirî 250 malbat vegeriyan, herwiha di rêya Qitmê re jî bêtirî 250 malbatî vegeriya, bi giştî di roja sisêyan de bêtirê 500 malbatî vegeriyan.
- Roja çarem di 05.12.2024an de bêtirî 100 malbatî di rêya Cebel El-Ehlam re û di rêya Qitmê re jî bêtirî 450 malbatî vegeriyan.
- Roja pêncan di 06.12.2024an de bêtirî 50 malbatî di rêya Qitmê re û bêtirî 70 malbatî di rêya Cebel El-Ehlam re vegeriyan.

**Hejmara giştî yê derbiderên vegeriyane Efrînê bêtirî 1920 malbatan dike**

**Ber bi Tebqayê ve**

Piraniya derbiderên Efrînê yên li Til Rifatê û derdorê bûn bi YPG re ber bi Tebqayê ve hatin koçberkirin, ku bas ji herêma Cizîtê ji wan re anîn û ew birin wir. Hejmara wan kesên derketine û venegeriyane Efrînê bêtirî 70 hezarî dike.

Derbider li lîstikgeha Tebqayê di konan de hatin komkirin, bêyî ku tiştekî ji wan derbideran re amade bikin. Derbider li ber wê serma û seqayê li kolanan li derve mabûn bêyî ku desthelatdariya PYD saziyên xwe demildest bişîne wê derê. Ji ber sermayê jî şîrmijek 4 mehî jiyana xwe ji dest da.

Di 07.12.2024an de bi hemahingî bi HTS re, çekdarên YPG bas ji Cizîrê anîn gundê Fêfînê û gundên derdorê, ku xelkê mayî jî bibin Tebqayê, tevî ku gelek ji wan derbiderên gihane Tebqayê poşmam bûne. Gelek malbatan berên xwe dane Kobanê û Qamişlo.

**Du sedemên sereke ku tevahiya derboderan venegeriyan:**

1- Gelek malbat bi YPG ve hatine girêdan, çi zarokên wan tevlî wan bibûn û çi jî di saziyên wê de kar dikirin.

2- YPG tirseke mezin di dilê xelkê de çandibû û digote wan eger hûn vegerin ,dê we bikûjin. Piraniya derbiderên vegeriyabûn, şok bûbûn ji ber tiştê bi wan re çêbûbû û digotin ew ê bêne kuştin û YPG digote wan nabe hûn vegerin ji ber Efrîn dagirkirî ye.

Lê di vê rewşê de çend pirs têne bîra mirov û divê em ji xwe bipirsin, gelo çima Reqa û Tebqa û ne Efrînê? Efrîn ne nêzîktir e ji Tebqayê? Çima  hin derbider bi guleyan dihatin armanckirin û hinek ji wan gefên kûştinê li wan dihate dixwarin?

**Helmeta Piştgiriya Vegeryayan**

Encûmena Xwecihî ya yekê ya Şepêla Azadî ya Kurdistanî li Ewropa, helmeta komkirina alîkariyên diravî ji derbiderên Efrînê re kom kirin, ku ew derbider vedigeriyan û pêdiviya wan bi alîkariya lezgîn hebû. Encûmena Xwecihî di daxuyaniya xwe de di 04.12.2024an de ragihand ku her tiştê bi dest wan bikeve û kom bibe, dê Şepêla Azadî li Efrînê wan alîkariyan li ser xelkê dabeş bike û her tiştî bi zelalî jî eşkere bike. Armanca ji vê raporê jî ev bû.

Daxuyaniya Encûmena Xwecihî tekez kir, ku vegera derbideran hêviyên xelkê yên li Efrînê mayî bilind dike û dibe alîkar, ku rê li ber guhertina demografî bigirin.

Her malbateke vegeryayî 100 Dolar ji bo kirîna keresteyên xwarinê yên pêwîst û pêdiviyên malê wergirt, herwiha mesrefa anîna derbideran ji Til Rifat û gundên derdorê hebû, ku hevalên Şepêla Azadî ew bi otombêlan vedigerandin. Her tiştê hatiye dabeşkirin, hatiye belgekirin, ku hem fatûre û hem nav û hejmara telefona malbatan tê de heye. lê ji ber taybetmendiya kesayetî em sûretên kesekî belav nakin.
Her kesê alîkarî bi rêya me şandiye Efrînê, wê raporeke darayî jê re were şandin, ku têde hejmara telefonê (hinek hene bê telefon bûn ji ber ku çekdran ji wan dizîbûn), wêne, fatûre û navên xelkê alîkarî wergirtine têde hebe.

**Spasî ji bo:**
- Bexşînerên bi me bawer kirin û alîkarî şandin Efrînê
- Xwebexş û hevalên Şepêla Azadî li Efrînê, ku xizmeta xelkê me kirin.

Encûmena Xwecihî ya yekê ya
Şepêla Azadî ya Kurdistanî li Ewropa

Çileyê pêşî/ 2024

# VEGER

Raporek derbarê vegera derbiderên Efrînê ji bo cih û warên xwe

ŞAK

Şepêla Azadî